Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1314 | 8-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 'Ji bo pêşxistina werzîşê pêwîst e ciwan xwe perwerde û rêxistin bikin'

Navenda Nûçeyan

**Rêveberê Meclisa Ciwanan a Werzîşê ya Kantona Cizîrê Zîr Qamişlo diyar kir ku ji bo pêşxistina qada werzîşê, pêwîst e ciwan xwe perwerde û bi rêxistin bikin û wiha got: "Di roja îro de dewletên dagirker dixwazin bi rêya werzîşê ciwanan bidin pişaftin."**



Werzîş amûreke girîng e ku têkiliyên civakî xurt dike. Werzîşên komî ango lîstikên tîman jiyana mirovan ji bo hevkariyê, ragihandinê û gihîştina armancên hevpar baştir dike. Werzîşên wekî goga piyan, basketbol û voleybol vebijarkên mezin in ku hem aliyên laşî û hem jî yên civakî xurt dikin. Werzîş ruhê tîmê û çanda xebata bi hev re pêş dixin.

Di derbarê xebat, çalakî û zehmetiyên werzîşê, Rêveberê Meclisa Ciwanan a Werzîşê ya Kantona Cizîrê Zîr Qamişlo ji Rojnameya me re axivî.

Zîr Qamişlo di destpêka axaftina xwe de balkişand ser xebat û çalakiyên werzîşê li herêmê û wiha got: "Wekî Meclisa Ciwanan a Werzîşê me gelek tîmên werzîşê li ser asta kantona Cizîrê bi rêxistin kirine, herwiha di kantona Cizîrê de 17 bajar hene û di her bajarekî de jî, me komîteya werzîşê daye avakirin. Bêguman me pêwîstî dît ku di her bajarekî de komîteyên werzîşê were avakirin da ku hîn zêdetir di nava kar û xebatên werzîşê de bingehek were danîn, bi rêya her komîteyekê berwerde tên dayin, ji ber ku dema berwerdeyên Îdelojîk û yên werzîşê tên dayin komîteyên bi rêxistinkirî û serkeftî derdikevin. Ji ber vê yekê em wekî ciwanan girîngî didin xweperwerdekirin û perwerde dayin. Bêguman leystokên herî navdar di bajarê me de goga piyan û voleybol e, li her bajarekî tîmên van lestokan hene, mîna bajarê Qamişlo, Dêrik, Girkê Legê, Terbespiyê, Çil Axa,Til Koçer, Rimîlan, Amûdê, Derbêsiyê, Zergan, Şedadê, Erîşa, Hol, Mergeda, Til Birek, Til Hemîs û Hesekê. Herwiha li bajarê mezin yên wekî Qamişlo, Hesekê û Rimêlan tîmên gelek leystokan



hene, ne tenê tîmên goga piyan û voleybol in. lê belê leystokên mîna Basketbol, Şetrancê, Pêşbazî, lestikvanên Hêzê, avjînî, Pîng Pong, tênis, Kîng boksîng û Karetê di nava xwe de dihewîne."

### Di her bajarekê de nêzî 40-50 lîstikvanê werzîşê hene

Zîr da zanîn ku di civaka me de tenê goga piyan û voleybol bala ciwanan dikşîne û wiha domand: "Di rastiyê de di civaka me de gelek leystok hene ku hatine ji bîr kirin û girîngî jê re nayê dayin, li ser vê esasê me Meclisa Ciwanan a Werzîşê da avakirin da ku ev leystokên hatine ji bîr kirin, ji nû ve di nava civaka me de vejîn û navdar bibin, leystoka ku herî zêde bala ciwanan dide kişandin goga piyan û voleybol e, lê ne ev tenê di werzîşê de ye, pêwîst e ciwan ji her rengê werzîşê hez bike. Li gor vê yekê jî Meclisa Ciwana ya Werzîşê karîbû piştgeriyê bide gelek ciwanan ku xwe di nava her beşê werzîşê de reng bidin çi xort be û çi jin be, bêguman di salên borî de me zehmetî ji aliyên hijmara kêm yên ciwanan dît, ji ber ku ew hezkirina ciwanên me ji werzîşê re pir kêm bû, di heman demê de piranî ji aliyên jinan de ku ji ber sedemên kevneşopiyên civakê nikarî bûn jêhatiyên xwe derxin holê. Lê belê piştî derketina rêzknameya werzîşê ku çawa karî piştgiriyê bide jêhatiyên ciwanan, êdî roj bi roj heya astekê baş hijmarên ciwanan di nava werzîşê de bilind bû ku di her bajarekî de nêzî 40-50 lîstikvanê werzîşê hene."

### Astengî û zehmetî

Zîr Qamişlo di berdewamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Ev nêzî 6 mehin ku Meclisa Ciwanan a Werzîşê hatiye damezrandin ku heya niha em di qonaxa avakirinê de ne, ji ber vê yekê leystikvan rastî hin zehmetiyan tên; mîna piştgirî, stadan û rewşa hewayî dema baran û ba hebe bandor li îptalkirina rahenanên leystikvanan dike. Bêguman ev zehmetî jî wê bi demê re derbas bibin. Ji bo van astengiyan jî em hewldanên mezin dikin da ku leystikvan bi hemû hêz û rehetî bileyze. Helbet dema ku astengî hebin û derfetên heyê kêm bin, li vir wê lawaztiya lestikvanan jî derkeve hole. Lê me kiriye plana xwe ya demên pêş de ku dibistanek ji bo werzîşê were avakirin, da ku astemgî nebin sedemên lawaztiya lestikvanan, pêwîst e em ji astengî û zehmetiyan mezintir û bi hêztir bin, da ku em bi awayekî xurt û aktîv bin. "

### 'Pêwîst e her kes xweperwerdekirinê bingeha jiyanê bibîne'

Rêveberê Miclisa Ciwanan a Werzîşê yê Kantona Cizîrê Zîr Qamişlo di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Şerê Taybet yê bûyî mekanîzmaya dîlkirin û birêvebirina civakê bi rengekî çewt, bi awayekî cidî bandorê li têkilî û rêbaza jiyana me kiriye. Niha dewletên dagirker bi riya werzîşê jî siyasetekî qirêj didin meşandin û bi taybet li ser jin û ciwanan. Bêguman em werzîş mîna dewletan bi kar nayinin, em ji bo berjewandî ango kilîtkirina ciwana di bin navê werzîşê, nakin. Di destpêkê de em werzîşê ji bo tenduristiya mirov didin pêş, di heman demê de ji bo parastin û dûrketina ciwanan ji teknelojiya û dijîtal mediya bikin. Kesê ku di xweperwederdekirinê de lawaz be û manefêstoya Rêber Apo ne xwîne wê xeteriya şerê taybet nas neke. Ji ber vê yekê pêwîst e xweperwerdekirin esasê jiyanê were dîtin da ku em nekevin kemîna şerê taybet de."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di ber de hat:**
- Li ber rabû; li hemberê wî serê xwe rakir; xwe anî qama wî.

**Di ser dilê min de şax daye:**
- Kîna wî di dilê min de pir mezin bûye.

**Dinya neyarê kewê ye, kew jî neyarê xwe ye:**
- Dijberê xizim û gelê xwe ye.

**Dûvên xwe li hev ba dan:**
- Tev de davik li ber min vedan; li hemberî min tev de lîstik çêkirin.

**Ez dizanim ka ew çend derhem e:**
- Ez wî pir baş nas dikim.

**Ez dizanim ka tîr ji kû ve hat:**
- Ez dijberê xwe nas dikim; min mijar fêm kiriye; ez dizanim ka kê wisa kiriye; ez sedema pirsgirêkê dizanim.

**Ezê bixwim wî xwerdî, tuyê bimirî bi wî derdî:**
- Ew tişta ku tu naxwazî, ezê bikim û tuyê ji wê qehrê bimirî.

**Gora hev dikolin:**
- Li dijî hev diaxivin; li dijî hev dixebitin.

**Gora wî kola:**
- Karê wî xirab kir; wisa kir ku derbarê wî de biryarên xirab hatin girtin; giliyê wî kir.

**Hatin rûyê hev:**
- Gotin dan rûyên hev; hatin hemberî hev; pirsgirêk di navbera wan de derketin.

**Her kes di serê wî de sîran diçîne:**
- Her kes dijminiya wî dike; her kes li dijî wî diaxive; her kes diavêjiyê.

**Heta poçikekê pê ve girê nede nasekine:**
- Dixebite sûcekî jê re peyda bike. Hev dixwin.
- Hev pir diêşînin; tiştên giran ji hev re dibêjin; tiştên nemayî tînin serên hev.

**Hevîr di zikên hev de distirin:**
- Hev pir diêşînin; li dijî hev pir diaxivin; pir diavêjin hev; hev piçûk dikin.

**Ji hev re cin û hesin in:**
- Navbera wan ne xweş bû; bûn neyarên hev.

**Ji hev re kêr û penîr in:**
- Ji hev ne xweş in; keyfa wan ji hev re nayê; ji hev pir aciz in.

**Ji xwe re kiriye reş:**
- Li ber çavê wî reş bûye; ji bo xwe kiriye dijmin; pir jê aciz e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Bi kamîreya Ayşa Silêman



Pira Bafid

# 'QSD'ê baweriya gel û navnetewî qezenc kir'



Rêveberê Meclisa Têkiliya Leşkerî ya QSD'ê ya bajarê Hesekê Hisên Selmo diyar kir ku her çiqasî dijmin xwedî teknîk û çekên pêşketî be, QSD'ê jî xwedî vîn, bawerî û hunera pisporiya ezmûna bi salan e û got, "QSD'ê di nava 10 salan de baweriya gel û nevnetewî qezenc kir."**R-3**

# Gurbetellî; Pêşenga xeta rojnamegeriya jina azad



Şoreşger û rojnamegera Kurdistanî Gurbetellî Ersoz bi estetîk û fikra jinê û bi pênûsa xwe bû avakera jiyana azad û vegotina rastiyan, ew di lêgerîna heqîqetê de bû pêşenga têkoşîna azadiya jinê. Herwiha ji bo domandina mîrateya wê di sala 2013'an de di salvegera şehadeta wê de, Yekîtiya Ragihandina Jinên Kurdistanê (RAJIN) hate ragihandin.**R-2**

Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1314 | 8-Cotmeh-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# 'Serêkaniyê wê ji dagirkeran re nebe war'



6 sal di ser dagirkirina Serêkaniyê re derbas dibin, koçberên ku niha li Kampa Serêkaniyê û Waşokanî dijîn diyar kirin ku ew herdem bi hêvî ne ku vegerin li ser warê xwe û wiha gotin: "Heya ku Serêkaniyê rizgar nebe û nekeve bin stîwana Rêveberiya Xweser û QSD`ê de, em venagerin."**R-6**

# LI HEMBERÎ KOMPLOYA NAVNETEWÎ, PÊVAJOYA AŞTIYÊ

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û tevahî gelê Kurd Komployeke Navnetewî hate destpêkirin û heta niha jî berdewam e. Lê bi berxwedana bêhempa ya Rêber Apo, bi têkoşîna bilind a Tevgera Azadiyê, gelê Kurd û dostên wan, komplo negihaşt armanca xwe, li hemberî wê jî Rêber Apo bi biryardariyeke mezin pêvajoya aştiyê daye destpêkirin.**R-4**




# Newroz û Ekîto ji HTŞ û biryara 188'an mezintir in



Hikumeta HTŞ'ê bi biryareke dûrî rêzdariya çandî li gorî daxwazên dewleta Tirk biryarnameya 188'an derxist. Tê de jî roj û cejnên dîrokî weke Cejna Newroz, Ekîto, Cejna Jinê û hwd... hatin paşguhkirin, lê ev cejn bi nirx û dîroka xwe ji HTŞ û biryara 188'an mezintir in.**R-7**

# 'Divê rewşenbîr di polîtîkayên herêmî de roleke çavdêrîkirin û analîzkirinê bilîzin'



Rewşenbî û mamosteyê Zanîngeha Rojava, Rakan Şêxê da zanîn ku kampanyayên medyayî û siyasî dest bi reşkirina Rêveberiya Xweser û QSD'ê kirine û herdem wan bi cudaxwazî û parçekirina Sûriyê tawanbar dikin û got, "Divê rewşenbîr di polîtîkayên herêmî de roleke çavdêrîkirin û analîzkirinê bilîzin."**R-5**

Li Reqayê çirûska yekem
Nehîr Pale R-2

9'ê Cotmehê yên bê dawî...
Zekî Bedran R-5


Komploger dîsa li Şamê ne!
Farûk Sakik R-5

# Gurbetellî; Pêşenga xeta rojnamegeriya jina azad

Şoreşger û rojnamegera Kurdistanî Gurbetellî Ersoz bi estetîk û fikra jinê û bi pênûsa xwe bû avakera jiyana azad û vegotina rastiyan, ew di lêgerîna heqîqetê de bû pêşenga têkoşîna azadiya jinê. Herwiha ji bo domandina mîrateya wê di sala 2013'an de di salvegera şehadeta wê de, Yekîtiya Ragihandina Jinên Kurdistanê (RAJIN) hate ragihandin.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Di seranserê dîrokê de, jinan di têkoşînên civakî, çandî, hunerî, rojnamegerî, siyasî û zanistî de ji bo dengê xwe bidin bihîstin, bi dijwariyên mezin re rû bi rû mane. Yek ji wan jinan jî Gurbetellî Ersoz e. Gurbetellî Ersoz, di 11'ê Tîrmeha sala 1965'an de li gundê Zîverê navçeya Palu ya Elezîzê ji dayik bû. Navê serpêhatiya jiyana Gurbetellî, wekî "kesera jiyana wê ye" bi hemû ked û bawerî di rojnamevaniyê de mîrateyek ji şopdarên xwe re hişt. Bi cesaret û tevgera xwe di kevneşopiya ragihandina azad de ji bo hemû jinan bû pêşeng.

**Gurbetellî Ersoz fedekariya rojnamevaniya jin e**

Gurbetellî Ersoz ku bi kevneşopa çapemeniyê ya sedsalî hêz da çapemeniya Kurd û bû yekemîn derhênera weşana giştî ya jin a çapemeniyê ya li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê. Wê jî wek jineke kîmyager, rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan û şoreşger dîrok nivîsand... Li derveyî normên civakî jiya û bi cudahî xwe û serhildêriya xwe hat naskirin. Jiyaneke wê ya dijwar hebû; teslîm nebû, teslîmî sîstema serdestiya mêran nebû... Hat darizandin, girtin, îşkence lê hat kirin. Agirê serhildan û tolhildanê yê di dilê wê de tu carî venemirî û li çiyayan hem karê rojnamevaniyê hem jî karê şoreşgeriyê bê dudilî kir.

**Gurbetellî bi çîrokên serhildanê mezin bû**

Gurbetellî di hevpeyvînekê de dibêje "Ez li gundê Zîver ê navçeya Palû ya Elezîzê ji dayik bûm." Gundekî çiyayî ye. Ji sala 1993'yan ve tune ye, ji ber ku..." Ji ber ku ew gund jî mîna bi hezaran gundên din ji aliyê dewletê ve hatiye şewitandin. Gurbetellî di malbateke xizan de hatiye dinê. Bavê wê li Almanyayê wek karker dixebitî û navê 'Gurbetellî' ji ber vê yekê lê dikin. Gurbetellî bi çîrokên berxwedana Seyîd Riza û Besê û bi çîrokên serhildanê mezin bû. Di wan çîrokan de xwe dît. Di dibistana seretayî de li gundê xwe qedand û bû yekemîn. Her çi qas gundî çûna dibistana navîn qebûl nekin jî û feodalî li gund serdest be jî, li hemberî kesên ku digot 'keç naxwînin' ji bo keçên gund bixwînin, bû destpêkek. Bi desteka bavê xwe dest bi dibistana navîn kir, piştî saleke zor û zehmet bi diya xwe re ji bo xwendinê çû li Edeneyê.

**'Min dest bi xwendineke bêrawestan kir'**

Dayika wê Fatma Ersoz ji ber ku nekarîbû bixwîne, dixwest zarokên wê bixwînin û heta nîvê şevê ranediket da ku zarokên wê bixebitin. Gurbetellî ku ji zarokatiya xwe ve li cem ên mafdar û bindest sekinî, dayika xwe bi hişmendî û wêrekiya xwe bi tenê nehişt. Gurbetellî bi dayika xwe re bi kirmanckî diaxivî û ji ber ku li dibistanê bi Tirkî nedizanî xwendekaran henek pê dikirin û di dersan de zehmetî kişandibû. Tevî van hemûyan jî dest jê berneda û gelekî xwend û xebitî.

Gurbetellî zor û zehmetiya wê demê, wiha rave kiribû: "Min dest bi xwendineke bêrawestan kir. Min xwend,; her ku ez westiyam, min li radyoyê guhdarî kir. Di dawiyê de baş hînî xwendin, nivîsandin, axaftina bi Tirkî bûm."

**Parvekirina zanîn û heqîqetê nîşaneya rêya Gurbetellî bû**

Di lîseyê de dixwest beşa hiqûq an jî têkiliyên navneteweyî bixwîne. Dema beşa kîmyayê qezenc kir, pir kêfxweş bû. Piştî xwendina xwe ya lîsansê li Enstîtuya Zanistê ya Çukurovayê dest bi mastera xwe ya li 'hawirdor û enerjiyê' kir. Gurbetellî ji kîmyayê, ji hemû madeyên ku dane hev û ji laboratuarê hez dikir. mamosteyê beşê haya xwe ji vê hezkirina wê çêdibe û rojekê van gotinan ji Gurbetellî re dibêje: "Hezkirina te ya laboratuarê şertê yekemîn ê zanyariyê ye. Lê divê tu ji bîr nekî ku heta tu tiştên ku hîn bûyî, bi yên din re parve nekî, tu wateya wê tune ye." Van gotinên mamosteyê xwe ji bîr nake û tev li têkoşîna xwe dike. Lê ders û amfiyan têrê nekirin ku tiştên di dilê xwe de bîne ser ziman. Tercîha wê ew bû ku zanîna xwe parve bike û ji bo gelê xwe têbikoşe. Çernobîl û Komkujiya Helebçeyê di jyana wê de dibin qonaxên girîng. Gurbetellî jî dest bi lêgerîna bersivên pirsên di serê xwe de dike: "Kîmyagerên ku divê herî zêde bi Çernobîl û Helebçeyê re eleqedar bibin, ez matmayî hiştim. Min gelek caran ji xwe pirsî, 'ez çi me, ez ê çi bikim?" Gurbetellî dema ku mastera xwe dike, 3 salan di beşa kîmyayê de asîstaniya lêkolînê dike û cara pêşî bi kovara "Hedef" re Tevgera Azadiya Kurdistanê nas dike.

**'Xweş e ku mirov xwe bighîne her derê'**


Gurbetellî ku zarokatiya xwe li Edeneyê derbas kir û di ciwaniyê de xwe avêt nava şoreşgerî û têkoşînê. Gurbetellî di heman demê de dest bi karê rojnamevaniyê dike û di 10'ê Kanûna 1990'î de tê destgîrkirin. Gurbetellî piştî lêpirsîna 15 rojan rastî îşkenceyên giran tê û piştre tê girtin û dişinin girtîgeha Meletiyê û 2 salan girtî dimîne. Wêneyekî ku di dema darizandina wê de li salona dadgehê hatiye kişandin, wêneyê şopên îşkenceyê yên li ser lêv û desten wê ye. Di wêneyên wê de tişta berbiçav, xêzên li eniya wê ne. Rûkeniya wê ya şermok û tûjbûna nêrînên wê, hem hêrs û hem jî bîrbiriya wê nîşan didan.

Piştî esareta 2 salan li ofîsa Edeneyê ya Ozgur Gundemê dest bi kar kir. Lê piştî demeke kurt di 15'ê Çileya 1993'yan de rojname hate girtin. Ji wê demê heta 23'ê Nîsana 1993'an dema ku bi fermî dest bi rojnamegeriyê kir, ji nivîsandinê bigire heta nûçeyan, ji bo hînbûna detayên rojnamevaniyê kedeke mezin da. Gurbetellî rêwîtiya xwe ya ji bo hînbûna rojnamevaniyê wiha vedibêje: "Bi rojnameyan xwe gihandina mirovan hêsantir e. Ez her tim xwendevaneke baş û rojnameyan bûm.

**li pey nivîsandina heqîqetê berdêlên giran didin**

Di demeke kin de dibe derhênera weşana giştî û ev yek dewleta Tirk aciz dike. Ji ber vê yekê, ji bo civînên serfermandariya giştî ya Tirk, serokkomarî û serokwezîriyê nayê vexwendin. Her wiha nûçegihan û edîtor nikarin xwe bigihînin serokwezîrî, wezaret, walî û şaredaran da ku nûçeyên xwe piştrast bikin û agahiyan jê wergirin. Gurbetellî û hevalên wê li kuçe û kolanan li pey nivîsandina heqîqetê dikevin û berdêlên giran didin. "Generalên Biçûk" ên Apê Mûsa jî ji van berdêlan bê par namînin. Di dema Rewşa Awarte ya li Kurdistanê de bi coş û kelecanî bi berdêla jiyana xwe wezîfeyên xwe bi cih anîn. Ya ku herî zêde Gurbetellî hêrs dike, astengkirina belavkirina rojnameyê, destgirtina nûçegihanan û qetilkirina belavkarên zarok e. Herwiha êrişên giran ên mîgrenê û spazma medêye... Di 29 saliya xwe de bi edîtor û nûçegihanan re di odeyeke biçûk de mîna ku bi salan rojname bi rê ve biribe, lê guhdarî kir, nîqaş kir û pêşniyar kirin. Dema ku Gurbetellî bû derhênera weşanê, ne tenê wateyeke pîşeyî lê gelek wateyên xwe hebûn. Ozgur Gundemê ku nûçegihanên wê, belavkarên wê hatin kuştin û girtin, para xwe ji her cure zilm û zordariya dewletê digirt. Di 10'ê Kanûna 1993'an de Roja Mafên Mirovan a Cîhanê de, bi sedan polîsan bi ser rojnameyê de girt. Gurbetellî li gel xebatkarên rojnameyê hate destgîrkirin û piştî 13 rojên destgîrkirinê, hate girtin. Îşkencey li wir dubare bûn, bi awayekî hovane lê dan, ji porê wê girtin û kişandin û li korîdor û pêlekanan kaş kirin... Gurbetellî wê demê şandin Girtîgeha Sagmalcilarê û di dadgeha yekemîn a Hezîrana 1994'an de hate berdan. Piştî ku hate berdan, heta demekê xebatên xwe yên rojnamevaniyê domandin.

**Kes nikare fikir û afirîneriyên Gurbetellî tune bikin**



Gurbetellî û komek hevalên wî di 7'ê Cotmeha 1997'an de li Başûrê Kurdistanê bi tankên Leopard ên leşkerên Tirk bi kar tînin û pêşmergeyên PDK'ê ve koordine dikin, hatin gulebarankirin. Cihê cenazeyê wê hê jî nayê zanîn. Gurbetellî ji pênûsan dûr neket. Şopdarên wê, ji bo rastiya di nava tarîtiyê de derxin holê, li her aliyê cîhanê çapemeniya şoreşgerî dimeşand.

**'Pêwîst e pênûs û peyva jin geş û berztir bibe'**

Gotina Gurbetellî Ersoz 'Agahî her ku tê parvekirin bi wate dibe, agahiya parvenekirî tu wateya xwe nîn e' ji bo jinan wê maneyê dide ku divê jin di her warî de xwe bi pêş bixin û pênûs û peyva wan geş û berztir bibe.

**Gubetellî bi qasî rojnameger şervana azadiyê jî bû**

Gubetellî rojnameger, şoreşger û çalakgereke Kurdistanê bû, li dijî feraseta yekparêz ruhê xwe yê têkoşînê derbasî ragihandinê kir, hat girtin, berdan, dîsa vegeriya rojnameyê û piştre berê xwe da çiyayan û di wê rêwîtiyê de dilê xwe li çiyayan nexişand. Gurbetellî bi ber zextên zêde, biryara xwe da ku têkoşîna xwe li çiyayên Kurdistanê bide meşandin û di sala 1995'an de tev li nava gerîlayan dibe û navê Zeyneb Agir wergirt.

**Îro roja bilindkirina pênûsa Gurbetellî ye**

Gurbetellî Ersoz li ser navê rojnamegeriya jina kurd şoreşek kiriye û ji rojnamegerên jin re bûye mînak. Gurbetellî Ersoz, zaneya jiyana azad, afrînera di oxira lêgerîna heqîqetê de bû pêşenga têkoşîna azadiya jinê. Di 7'ê Cotmeha sala 2013'an de ku salvegera roja jina şoreşger û pêşenga ragihandina jinê Gurbetellî Ersoz bû, Yekîtiya Ragihandina Jinên Kurdistanê (RAJIN) hate ragihandin. Li ser vê bingehê rojnamevanên jin ên Kurd û xebatkarên çapemeniya azad, li ser şopa Gurbetellî li hemû welatên lê ne, li bajar û çiyayên Kurdistanê rojnamegeriya heqîqetê berdewam dikin.

## Ji Pênûsa Jin

### Li Reqayê çirûska yekem

**Nehîr Pale**

Emîne El-Elî yek ji çirûskên serhildanê yên yekem bû, kûr dipijiqê tarîtiyê. Destpêke li hemberî zayendperestiyê helwest nîşan dide piştre tevlî xebatê dibe, biryar dide bi temamî ji saziya malbatê qut bibe û bi nasnameya şoreşgeriyê dest bi têkoşînê bike.

Di civaka Ereb ku Emîne lê mezin bûye hewldanên şoreşan tu carî derneketine pêş. Bi taybet jin dest bi şoreşê bike li wan biyanî ye û sosret e. Ew jî eşîr in li gel wan kevneşopî, ol, şeref û namûs pîroz in. Mîna hemû jinan li ser Emîne jî zextekî ruhî û mejî yê mezin hebû. Hewldanên mêr ku gurûra wê bişkînin, destdirêjî rûmeta wê bikin û fêrî koletiyê bikin, gelekî dijwar bûn. Zeyendperestî ne sal bi sal, bi kêliyan cigerê wê dirizand û dixwestin çavên wê bişkîn in. Li beramberî êrîşên têne kirin, her tim xwe û jinên li derdora xwe diparêz e. Emîne êdî gihîştibû pêvajoya teqînê û biryareke ku ji malbat û civaka wê re gelekî zor bû, da.

Li taxa Mişlib a bajarê Reqayê sala 1995`an ji dayîk dibe. Mişlib weke cî di nava tax û gund de maye. Ji hemû taxên Reqayê zêdetir feraset û kevneşopiyên eşîretê lê hene. Hevala Emîne jî ji êla Bo-Himêd a qebîleya Bo-Şaban bû. Ew jî mîna hemû jinên eşîreta Bo-Himêd jê dihat xwestin kevneşopiyên eşîretê biparêze û berovajî wan tevneger e.

Enerjiyek di hundirê Emîne de hebû, li gorî bav, bira û kevneşopiyên eşîretê tevnedigeriya. Ew jî mîna her jinekê li hemberî sîstema desthilatdar bi nakok bû. Di malbat û eşîreta wê de mêr her tim xwe li ser jinê ferz dikin, çiqasî birayên Emîne dixwestin li ser serê wê bin, bertek jê derdiket û serweriya kesî qebûlnedikir. Ew zaroka navîn bû, ji keçan û lawikan jê mezintir hebûn lê belê ya mal birêve dibir Emîne bû.

Emîne heyanî zanîngehê dixwîne, sala 2017`an di şert û mercên koçberiyê li bajarê Serêkaniyê yê kantona Cizîre dibe nûçegîhana Ajansa Hawar a nûçeyan (ANHA). Piştî rizgarkirina Reqayê ew vedigerin û Emîne xebatên xwe yên nûçegîhaniyê berdewam dike. Dema xebatên raghandinê li Reqayê birêxistin dikin, Emîne dibe rêveberiya navendê. Hem nûçegîhaniyê dike hem jî rêveber e. Bê guman li gorî zanebûna xwe navendê birêve dibe, di xebatên rêveberiyê de nû bû, li beramberî rê û rêbazên wê yên rêvebirina xebatê bertekên dijwar derdiketin. Tişta herî zehmet nizanîbû çawa nêzî pirsgirêka jin û mêr bibe, têbikoşe û pirsgirêkan çareser bike. Di gelek rewşan de Emîne tanîn rewşa li bendê bûn ku gav paşve bavêje û xwe bide paş. Balkêş bû; Emîne xwe nedida paş dîsa xebatên xwe yên rêveberiyê berdewam dikir. Çiqasî wê zehmetî û zorahî jiyankiriban jî, lê ew ne zik reş bû û exlaqên wê têrê dikir ku insanan efû bike. Li gel Emîne ya girîng rûmeta wê bû û ji bo baskên wê neşkînin, tenê çiwîna çiyan li pêşiya wê mabû. Dudilî pêre nebû û ji Reqayê bê ku li tu deverî bisekine çemê Dicle qut kir û derbasî çiyan bû. Ne malbat û ne jî sînor dikarîbûn li pêşiya Emîne bibin kelem.

Sala 2019`an beşdarî Tevgera Azadiyê bû û sala 2020`an li Herêma Avaşîn a Dêra Zorê şehîd bû.



# Ji destkeftiyên şoreşê; Meclisa Wêjeyî

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştî lidaxistina şoreşê di warê wêjeyê de gavên mezin hatin avêtin, ji wan gavên berbiçav jî avakirina sazî û dezgehên rewşenbîr û wêjeyî ne. Û yek ji wan destkeftiyên bingehîn avakirin Meclisa Wêjeyî ye ku di bin sîwana wê de 6 saziyên wêjeyî hene.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Mecilsa Wêjeyî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi armanca pêşxistina wêjeyê û nêzîkbûna saziyên wêjeyê bi hev re di sala 2025"an de hate damezrandin, di bin sîwanan vê meclisê de 6 saziyên wêjeyî hene ew jî ev in: Dîwana Wêje, Weşanên Şilêr, Kovara Şermola, Wergera Mezepotamiya, Ofîsa Amara û Dar Mezepotamiya ye.

**Dîwana Wêjeyê**

Komîteya Wêjeyê ya Rojava ku niha navê wê Dîwana Wêjeyê ye; ji hemû nivîskar û wêjevanan re bûye sîwan. Dîwana Wêjeyê ji sala 2016'an li ser bingeha şoreşê ji cîhanê re bi rêya wêjeyê tevdigere. Dîwana Wêjeyê di gelek waran de piştgiriyê dide komîteyên ku ava kirine, dîwan piranî pirtûkên hatine nivîsandin, dinirxîne. Hefteya Wêjeyê ku ev çar sal in tê lidarxistin û biryar e her sal bê lidarxistin, organîze dike. Di Hefteya Wêjeyê ya ku 6 rojan dewam dike beşên çîrok, helbest û romanan tên xwendin û nirxandin. Hefteya wêjeyê di sala xwe ya yekem de li Qamişlo hate lidarxistin, sala duyem Kobanê, sala sêyem li Dêrik û îsal jî di sala xwe ya çaremîn de li bajarê Hesekê hat lidarxistin. Herwiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê semîner û panel tên lidarxistin. Dîwana wêje karê wan bêhtir girêdayî wêjeya kurdî ye, ji bo ciwanan komxebatên Dîwana Wêjeyê hene. îsal wê 17 pirtûkên bi zimanê erebî û kurdî di pêşengeheka Şehîd Herkol de di bin sîwana Şilêr de were pêşkeşkirin. Di demên pêş de wê pirtîkekê lêkolînê li ser wêjeya zarokan û rexneya wêjeyî çêbikin, herwiha ji bo festîvala Osman Sebrî û festîvalên li Kobanê têne lidarxistin Dîwana Wêje bi wan re dibin alîkar.

**Weşanên şoreşê: Şilêr**

Weşanên Şîlêr di sala 2017"an de hatiye vekirin. Bi zêdebûna hejmara nivîskarên Rojava re, pêdiviyeke wiha derket holê. Beriya weşanxaneyê pirtûk dihatin weşandin, lê weşanxaneyek ku hemû nivîskaran hembêz bike tune bû. Bi vebûna Şîlêr re bû navnîşana nivîskarên ku bi kurdî dinivîsandin. Ev weşanxane ji bo nivîskaran yekemîn bû. Weşan pirtûkan bi hemû zimanan çap dike weke: Erebî, Kurdî, Turkî û zimanê biyanî. Weşanên Şilêr îsal bi gelek guhartin û projeyên nû derket pêş. Berê navê wê weşanxaneya Şilêr bû lê îsal bû Weşanên Şilêr herwiha logoya wê hat guhartin. Di pêşerojê de jî wê Weşanên Şilêr pirtûkên kurdî wergerîne hemû zimanên biyanî, herwiha wê bi xebatek hevkar bi Dar Mezopotamya re 7 pirtûkên hevkar bi hemû zimanan li Şamê çap bikin.




**Mezopotamya Wergerê**

Mezopotamya ya Wergerê di sala 2014"an de hate avakirin, di destpêka avakirina wê de wê werger ji saziyên din re dikir, weke rapor û rêzikname werger dikirin. Lê ji 2019"an de û pêş de dest bi wergera pirtûkan kir, di salê de ji 10 heta 15 pirtûkan werger dike, heta niha zêdetirî 40 pirtûkan werger kirine bi zimanê erebî û kurdî. Di pirojeyê wan ên dema pêş de wê 11 pirtûkan werger bikin.

**Pirtûkxaneya Amara**

Pirtûkxaneya Amara di sala 2018" an de hate damezrandin, bi armanca ku nifşê nû bêhtir bi xwendinê mijûl bibe û xwendin li pêş bikeve. Tê de 4 karmend kar dikin û di pirtûkxaneyê de nêzî 20 hezar pirtûk û 8 hezar sernivîs hene. Pirtûkxane ji hemû kesî re vekiriye, ev pirtûk ji gelek walan in. Pirtûkên pirtûkxaneyê wiha ne (felsefî, zanistên civakî, roman, helbest, çîrok, lêkolînên wêjeyî), pirtûk bi zimanê erebî, biyanî, bi zaravayê kurdî wekî zazakî û kurmancî ne. Pirtûkxaneya Amara her sal beşdarî festîvala Ş.Herekol dibe û îsal jî wê beşdar bibe. Pirojeyek wan heye ku ew Pirtûkxaneya Amara li Hesekê jî vekin.

**Kovara Şermola**

Şermola kovareke wêjeyî, çandî, demsalî û serbixwe ye ku bi zimanên kurdî (kurmancî) û erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê (Rojavayê Kurdistanê) tê weşandin. Hejmara yekem di 7'ê sibata 2019"an de li Qamişloyê derket û heta niha 26 hejmar derketine. Kovara Şermola her 3 mehan derdikeve, kovar bêhtir balê dikşîne li ser mijarên civakî û çandî. Beşên ku kovar di nava xwe digre ev in: werger, wêjeya jin, çîrok û helbest in.

**Dar Mezopotamya**

Dar Mezopotamya di sala 2021"an de hate damezrandin, 43 pirtûkin cîhanî çap kirine. Dar Mezopotamya bêhtir balê didin li ser roman, helbest û lêkolînên bi zimanê erebî. Ew gelek kar xebat dane meşandin ji dema damezrandina wan de ku pêşbirkan di lidardixin, herwiha beşdarî festîvalan dibin. Wê di navber Dar Mezopotamya û weşanên Şilêr de 7 pirtûk li Şamê jî bên çapkirin di pêşerojê de, herwiha wê Dar Mezopotamya komxebatekê ji nivîskaran re vekin, herwiha wê bêhtir guh bidin çapkirina pirtûkên zarokan. Dar Mezopotamya yekem weşanxaneya Kurdî ya lîsanskirî ye.

# Newroz û Ekîto ji HTŞ û biryara 188'an mezintir in

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Hikumeta HTŞ'ê bi biryareke dûrî rêzdariya çandî li gorî daxwazên dewleta Tirk biryarnameya 188'an derxist. Tê de jî roj û cejnên dîrokî weke Cejna Newroz, Ekîto, Cejna Jinê û hwd… hatin paşguhkirin, lê ev cejn bi nirx û dîroka xwe ji HTŞ û biryara 188'an mezintir in.**

**Yekalîbûna HTŞ'ê**

Bi rûxandina rêjma Baas re hikumeta veguhêz, desmalek avêt li ser HTŞ'ê ango vê hikumetê HTŞ'ê kire bin ebayekî reş. Nîv taybetmendî ji vê hukumetê ji hikumeta Baas û nîv ji HTŞ'ê hat wergirtin. Li ser wê bingehê hemû kiriyarên HTŞ'ê li ser gelên Sûriyê da meşandin. Siyaseteke yekalîbûnê di hemû waran de ji hêla hikumeta veguhêz ve dihat meşadin. Di destpêkê de kongreya niştîmanî, ragihandina destûra Sûriyê, tevlîbûna hikumetê ji bo civîna Netewyên Yekbûyî ya serokên cîhanê, hem jî di dema heyî de hilbijartinên parlementoya Sûriyê tên lidarxistin. Bi vî rengî ji roja hatina hikumeta veguhêz li ser desthilatdariyê ve heta roja îro siyaseteke yeknerînbûn, yekalîbûyîn û paşguhkirinê daye meşandin. Biryara 188'an a girêdayî rojên dîrokî û netewî ku ji hêla hikumeta HTŞ'ê ve hat dayîn jî rengeke ji rengê paşguhkirin û şerê çandî ye.





**Qedexerkirina çandên cuda**

Di gel pêkanîna komkujiyên Berava Sûriyê û Siwêdayê hem jî teqîna Dêra Mar Ilyas ya Şamê, dagirkirina Minbic û Şehba, dilê vê hikumetê û komên biyanî hem jî çeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker hînik nebû ji xwînrijînê. HTŞ û komên çete bi piştgiriya dagirkeriya Tirk êriş û şerê fîzîkî li hemberî gelên Sûriyê dan meşandin. Herwiha şerekî taybet ji bo gurkirina agirê şer bi riya MÎT a Tirk hat birêxistinkirin û amadekirin. Lewma jî da ku tevahiya şer li Sûriyê bê rawestandin û destûreke bingehîn ku mafê çandî, siyasî, bîrdozî, oldarî, civakî û hwd… yê hemû pêkhateyên Sûriyê bispêre xwe, peymana 10'ê Adarê hat îmzekirin. Lê piştî wê ragihandina destûrî hat ji hêla hikumeta HTŞ'ê ve der ket. Derketina destûrê Sûriyê yek ji gavên destpêkê yên ku HTŞ'ê di warê şerê çandî û qedexekirina çandên pêkhateyên Kurd, Ermen, Suryan, Çerkez û hwd… de hat avêtin bû. Li ser daxwazên dewleta Tirk hêz, vîn û xwesteka hikumeta veguhêz ji bo destûreke yekreng, yeknetew, yekal, yekziman, yekçand xurtir bû. Ev destûr mîna şûrekî li pişta peymana Adarê hat xistin. HTŞ li ser esasê piştguhkirin û dûrxistina pirrengiyê biryara 188'an di 4'ê derxist. Di vê biryarnamê de jî rojên ola Islamî, rojên taybet ji bo HTŞ'ê û hin cejnên ola Xirstyanî hatin destnîşankirin. Herwiha Cejneke weke Newroz, Ekîto û Cejna Jinê ya Cîhanî tevlî vê biryarnamê nebû, lê belê roja Şehîdan ya roja 6'ê Gulanê ji lîsteya rojên niştîmanî hat rahiştin, hêjayî bibîrxistinê ye ku di 6'ê Gulana 1916'an de komkujiyek li ser destê Osmaniyan de di derheqê komek şoreşgerên rewşenbîr hatin kuştin, ev biryar li ser xwesteka dewleta Tirk hat pêkanîn.

**Newroz, Cejna Jinê û Ekîto ji hikumeta HTŞ û biryara 188'an mezintir in**

Ekîto sersla gelê Aşûrî, Suryanî û Kildanî ye ev cejn vedigere hezarên salan beriya zayînê, herwiha ew yek ji kevintirîn cejnan e di dîroka Rohilata Navîn de. Di heman demê de gelên Suryan, Kildan û Asûrî di 1'ê Nîsanê de Cejna Ekîto pîroz dikin, Cejna Ekîto ji 6 hezar û 774 salan ve û heta niha li seranserî Sûriyê, Tirkiyê, Îraq, Lubnan û hwd… tê pîrozkirin. Cejneke wke Ekîto ku ji girîngtirîn cejnên netewî û olî tê hesbandin, çawa dûrî lîsteya cejn û rojên niştîmanî dibe. Roja 21'ê Adarê ango Cejna Newrozê xwedî dîrokeke kevnar e, vedgere serdema berî zayînê bi taybet sala 612'an, ev cejin weke boneyeke ji bo gelên Arî tê hesbanidn. Ji bo gelê Kurd xwedî cihekî pîroz e û kevintirîn cejina netewî li ser asta cîhanê tê dîtin, ew tê wateya azadiyê. Cejna Jinê cejneke cîhanî ye fermiyeta wê li seranserî cîhanê xwedî nirxeke, paşguhkirina wê ji hêla hikumeta HTŞ'ê ve jî tê wateya ku ew ji hêza jinan ditirse û fermiyeta vê rojê dibe sedem ji rûxandina desthilatdariya HTŞ'ê re.Newroz, Ekîto, Cejna Jinê û hemû rojên niştîmanî yên tevahiya pêkhateyên Sûriyê xwedî nirxekî çandî û civakî yên mezin in, herwiha her pêkhateyek ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi azadî boneyên xwe pîroz dikin. Lewma jî divê hikumeta HTŞ'ê biryara 188'an û ragihandina destûrî ji bîr bike û rêzdariyê ji çandên pirreng ên Sûriyê re bigre.

# Li hemberî Kompleya Navnetewî, Pêvajoya Aştiyê

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û tevahî gelê Kurd Komployeke Navnetewî hate destpêkirin û heta niha berdewam e. Lê bi berxwedana bêhempa ya Rêber Apo, bi têkoşîna bilind a Tevgera Azadiyê, komplo negihaşt armanca xwe, li hemberî wê pêvajoya aştiyê hat destpêkirin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Komplo û komplogerî ji destpêka dîroka şaristaniyê hetanî şaristaniya kapîtalîst, di destê desthilatdaran de weke amûrekî ya domdarîkirina desthilatdariya xwe hatiye bikaranîn. Tevahî kral, împarator, wezîr, xanedan û serokên dewletan ev yek ji bo berdewamkirina destihaldariya xwe bikar anîne. Komplo û komplogerî weke berhemên ku ji hêla kesên serdest ve hatine dîtin, bikaranîn û pêşxistin tê dîtin. Tevahî deng, reng û kesên ku li dijî wan radibin bi rêya komployê hatine qutkirin, bêdengkirin. Di heman demê de, tevahî lêgerînên azadiyê jî hatine çewisandin. Armanca hêzên desthilatdar, mêtînger, hêzên hegemonîk, emperyalîst û pergala baviksalarî ew e ku civakên nirxên exlaqî-polîtîk dihewînin bikin kole û ji metîngeriyê re vekirî bihêlin, herwiha ev civaka rast a ku nûnertiya exlaqê azadiyê dike tune bike û ji holê rabike. Di dîrokê de yek ji gelê ku bi komplo û komplogeriyê re rû bi rû maye gelê Kurd û gelên azadîxwazin.

28 sal berê mînaka vê komplogeriyê li dijî Rêberê Apo, Tevgera Azadiyê, gelê Kurd û tevahiya gelê azadîxwaz hate destpêkirin. Herwiha di şexsê Rêber Apo de nasnameya civakekî exlaqî ya girêdayî azadî, wehkevî, edalet û parvekirinê pêş ket. Ango Rêberê Apo di civaka Kurd de zanistiyeke nû ya azadiyê daye qezenckirin. Li ser vê bingehê jî di bin felsefeya Rêberê Apo de hebûna gelê Kurd a ku ber bi tunebûnê ve diçû sekinand. Di heman demê de, gelê Kurd hem li Rojhilata Navîn hem jî ji bo tevahî gelên azadîxwaz pêşengtiya têkoşînê dikin. Ev 28 salan ku Rêber Apo di girîgehê de girtî ye, ruxmî ku li gorî zagonên navdewletî, edalet û mirovahiyê pêwîst e tu kes zêdeyî 25 salan di girtîgehê de nemîn e.

### Despêkirina komployê

Fermandarê Hêzên Bejahiyê yê Artêşa Tirk a dagirker yê wê demê Atîlla Ateş di 18'ê Îlona 1998'an de bi awayekî eşkere gef li Sûriyeyê xwar û ji hikumeta Sûriyê ya wê demê xwest ku Rêber Apo ji Sûriyê bê derxistin. Herwiha Serokkomarê dewleta Tirk a dagirker yê wê demê Suleyman Demîrel jî li Parlamentoya Tirk bi heman awayî gef li Sûriyeyê xwar. Herwiha dewleta Tirk bi piştgiriya Emerîka, Îsraîl û Brîtanyayê têkildarî Rêber Apo gefa li ser Sûriyeyê zêdetir kirin. Di cîhana Ereban de jî serokê Misrê Husnî Mubarek ketibû tevgerê. NATO û welatên Ewropayê jî bi heman mebestê ketibûn nav hewldanan. Dewleta Tirk 35 hezar leşker li ser sînorê Sûriyeyê bi cih kiribû. Di encam de Rêber Apo biryara terkkirina Sûriyeyê da.

Di 9'ê Cotmeha 1998'an de li dijî Rêber Apo kompoyeke navneteweyî hat destpêkirin. Hêzên hegemonîk ên modernîteya kapîtalîst û hevkarên wê, nexasim dewletên neteweperest ên herêmê, di komployê de cih girt. Di destpêka komployê de Rêber Apo ji Sûriyeyê derket û di 15'ê Sibata 1999'an de dîl hate girtin.

### Hêzên cihê xwe di nexşeya komployê de girtin

Bi awayekî rastersat DYE, Brîtanya, Îsraîl, Yewnanistan, Fransa, Hollanda, Rûsya, Elmanya, Kenya û Misr tevlî nexşeya vê komployê bûn. Herwiha gelek hêz û tevgerên herêmê jî beşdarî komployê bûn. Di heman demê de, Rêber Apo derbarê destpêkirina komployê û rola Sûriyê wiha dibêje: "Serokê DYE'yê Clinton ji bo derxistina min ji Sûriyeyê guftûgo bike, carekê li Şamê û cara din jî li Swîsreyê ji çar saetan zêdetir du civîn bi serokdewlet Hafiz Esed re pêk anîn. Hafiz Esed di wan hevdîtinan de li girîngiya mijarê hayedar bû. Ji bo xwe di cih de dît ku pêvajoyê dirêj bike. Ji bo demekê be jî ji min derketina ji Sûrî nexwest. Li dijî Tirkiyê dixwest min weke hêmaneke tewazunê heta dawiyê binirxîne. Lê min jî Sûriyeyê dahf dida ji bo bibe xwedî helwesteke stratejîk. Lê hêza min û rewşa min derfet û îmkan nedidan ku ez di vê de bi ser bikevim."


Rêber Apo di axaftineke xwe ya li ser wê demê de ragihandibû ku li pêşiya wî du alternatîf hebûn; yek jê derketina serê çiyê, ya din jî çûyîna Ewropayê bû, wî jî çûyîna Ewropayê hilbijartiye ji ber ku xwestiye pirsgirêka Kurd bi rêya siyasî û diyalogê çareser bike. Rêber Apo di 7'ê Cotmehê de bi Wezîrê ragihandinê yê wê demê yê Yewnanîstanê Konstantînos Bantoûvas ê hat Sûriyeyê re hevdîtin kir. Konstantînos soz da ku li Yewnanîstanê ew ê alîkariya çareseriya pirsgirêkê bikin. Di vê dema ku ji bo sûîqestê jî rêxistinên îstîxbaratê dabûn dû Rêber Apo ku cihê wî tespît bikin, mayîna Rêber Apo li Sûriyeyê bi giştî jî li Rojhilata Navîn zehmet bû."

### Rêber Apo di 9'ê Cotmeha sala 1998'an de ji Sûriyê derket

Rêber Apo di 9'ê Cotmeha sala 1998'an de ji Sûriyeyê derket. Bi bablafira Rêyên Hewayî yên Sûriyeyê çû Yewnanîstanê. Banteoûvas ê ku soz da Rêber Apo diviyabû ew li balafirgehê pêşwazî bikira, lê li balafirgehê ew tinebû. Piştî ku daket balafirgeha Atînayê sozên ji Rêber Apo re hat dayîn, bi cih nehat anîn. Rêber Abdullah Ocalan berê xwe da Moskowayê û 33 rojan li Rûsyayê ma. Di vê demê de Rêber Apo daxwaza penaberiya siyasî li Rûsyayê kir. Di 4'ê Mijdarê de Meclisa Dûma, 298 parlametneran pêşnûem biryara ji bo naskirina mafê penaberiya siyasî ya Rêber Apo erê kirin. Lê belê li ser navê Wezîra Karên Derve ya DYA ya wê demê Madeleîne Albîrght berdevkê wê James Rûbîn daxuyaniyek da; nerazîbûn nîşanî vê da û diyar kir ku ew ê naskirina mafê penaberiyê ji aliyê ti welatî ve qebûl nekin. Serokwezîrê Rûsyayê Yevgenî Prîmakov destûr neda Rêber Apo li Rûsyayê bimîne û jê xwestin, Rûsyayê biterikîne.

### Rêber Apo di 12'ê Mijdara 1998'an derbasî Îtalyayê bû

Rêber Apo, li ser vê kompleya ku Rûsya jî tevlî bû, berê xwe da Îtalyayê û di 12'ê Mijdara 1998'an bi balafirê derbasî Îtalyayê bû. Tevî ku Îtalyayê soz dabû jî, piştî ku Rêber Apo hat nava xaka Îtalyayê, der heqê wî de biryara girtinê hat dayîn. Kurdên li Ewropayê jî herikîn Îtalyayê û xwedî li Rêber Apo derketin. Kurdan li nêzî mala Rêber Apo lê dema çalakiya rûniştinê pêk anîn. Mayîna Rêber Apo li Romayê êdî nepêkan bû. Piştî 66 rojan, di 16'ê Çileya 1999'an de ew ji Romayê derket û careke din berê xwe da Rûsyayê. Ji kêliya ku Rêber Apo hat û pê ve Rûsyayê dabû xuyakirin, ku ew ê wî qebûl neke. Biryar hatibû dayîn ku di ser Ermenîstan Karabagê re li Kurdistanê vegere. Lê belê dema li balafirê siwar bû, rêya balafirê bi awayekî derveyî kontrolê hat guhertin û ew li Duşanbe hat danîn. Di 26'ê Çileyê de jê xwestin ku wir jî biterikîne. Bi tenê rêyek li pêşiya Rêber Apo mabû, ji nû ve li Yewnanîstanê vegere, bi balafireke ku hate kirêkirin ew li Balafirgeha Navneteweyî ya Atînayê peya bû. Lê destûr jê re nehat dayîn ji bo li Yewnanîstanê bimîne. Rêber Apo vê carê çûyîna Hollanda weke pêşniyar pêşkêşî rayedaran kir, ji bo derkeve pêşberî dadgeha navneteweyî



Hollanda hilbijartibû. Li gorî hatibû gotin wê balafirekê Rêber Apo ji Atînayê bibira bajarê Rûsya Spî Mînsk û ji wir jî bi balafireke din biça Laheyê. Lê dema ew li Balafirgeha Mînskê peya bû, balafira wê pê biça Laheyê li holê nebû. Ji ber vê yekê ew neçar ma vegere Yewnanîstanê û ji ber zextê terikandina welêt lê hat kirin, vê carê bi heman balafirê ji Girava Korfû re hat şandin. Piştî wê berê Rêber Apo dan welatên Afrîkayê.

### Çûyîna Afrîqiyayê

Di 2'ê Sibata de berê balafira Rêber Apo dan Kenyayê. Rêber Apo li Kenyayê li hemberî zextan li ber xwe dida. Tevî zextên Amerîkiyan û Yewnanîstanê jî Sefaretxaneya Bilind a Yewnan neterikand. Kenyayê di 15'ê Sibatê de xwest Rêber Apo bê dersînorkirin. Bi şertê çûyîna Hollandayê terikandina avahiyê qebûl kir. Lê belê wesayîta ku ew dibir balafirgehê ji nişka ve ji nava konvoyê derket û winda bû.

Rêberê Gelan Rêber Apo di 15'ê Sibata 1999'an de hat revandin û li Girtîgeha Yek Kesî ya Ewlekariya Bilind a Îmraliyê hat bicihkirin.Piştî ku ew li Girtîgeha Îmraliyê hat bicihirin, girav bi temamî weke herêma ewlekariya taybet hat îlanirin û tedbîrên awarte yên leşkerî hatin wergirtin.

### Armanca Komplogeran

Rêber Apo derbarê armanca Kompleya Navneteweyî de wiha dibêje: "Hêzên komploger PKK li hemberî projeya mezin a Rojhilata Navîn weke astengî didîtin.

### Rêber Apo bi felsefe û ramanên xwe komplo vala derxist

Rêber Apo ji nirxandinên xwe yê li gorî demê li Girava Îmraliyê de paraznameyên ku nivîsandin de kompleya navdewletî ronî kir û vala derxist. Armaca sereke ya hêzên kompolger ew bû ku di şexsê Rêber Apo de doza azadiya Kurdistan û felsefeya Rêber Apo ji holê rakin. Weke ku di hebû serdemên berê de kirine, lê belê berovajî wê Tevgera Azadiya Kurdistanê li ser hîmên felsefa Rêbertî rêxistin, têkoşîn, perwerde û hebûna xwe di çiyayên azad e kurtir kirin. Tevgera Azadiya Kurdistanê bi têkoşîna xwe ya 50 salî armanca komployê vala derxist. Di heman demê de, pêvejoya aştî û civaka demokratîk ya ku Rêber Apo daye destpêkirina Kompleya Navnetewî vala derxist.

Ji wê zêdetir felsefe û ramanê Rêber Apo hişt ku kompleya navdewetî ji wateya xwe derkeve. Herwiha felsefe, fikir û ramanên Rêber Apo yên azadî, demokrasî û aştîyê li tevahiya cîhanê belav bûye. Di heman demê de, gelek azadîxwazên cîhanê piştgirtiya xwe ji bo felsefe û ramanên Rêber Apo dan nîşandan. Ev felsefeya rêbertî tişt ku hêzên komploger xwe bavêjin ber rêbertî, ji bo çareserkirina pirsgirêka tevahiya Rojhilata Navîn.

Rêber Apo piştî berxwedanî û têkoşîna 27 salan, di 27'ê Sibatê de banga Aşîtî û Civaka Demokratîk kir. Ev bang li tevahiya Rojhilata Navîn û cîhanê deng ve da, gelek azadîxwazên cîhanê piştgirtiya xwe ji vê bangê re kirin. Di heman demê de, li ser vê bangê Tevgera Azadiyê (PKK) kongrê xwe yên 12 emîn li darxist. Herwiha li ser banga Rêber Apo a bi dawî kirina şerê çekdarî komek ji PKK'ê bi merasîmeke sembolîk çekên xwe şewitandin, ev yek jî weke nameyekê bû ji bo tevahî cîhanê û hêzên dijber ku em şerê çekdarî radiwesînin û ji bo doza gelê Kurd û Kurdistanê derbasî qonaxa siyasî û qanûnî dibin.

Ruxmî ku Tevgera Azadiyê tevlî qonaxa siyasî û qanûnî bû, di heman demê de komisyona ku hatî avakirin, ji bo azadiya Rêber Apo. Lê hate niha ji aliyê dewleta Tirk ve tu gavên piratîkî ne hatiye avêtin. Ev yek diyar dike ku deweleta Tirk naxwaze ku aşîtî û demokrasî pêk were, pêwîst e dewleta Tirk gavên cidî bavêje, da ku mafê hêviyê pêk were û civaka demokratîk û aşîtî were avakirin.



# 'Divê rewşenbîr di polîtîkayên herêmî de roleke çavdêrîkirin û analîzkirinê bilîzin'

Rewşenbî û mamosteyê Zanîngeha Rojava, Rakan Şêxê da zanîn ku kampanyayên medyayî û siyasî dest bi reşkirina Rêveberiya Xweser û QSD'ê kirine û herdem wan bi cudaxwazî û parçekirina Sûriyê tawanbar dikin û got, "Divê rewşenbîr di polîtîkayên herêmî de roleke çavdêrîkirin û analîzkirinê bilîzin."

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Zext, siyaseta reşkirinê, herwiha gef û êrişên li dijî herêma Baku û Rojhilatê Sûriyê, hem jî erkdariya rewşenbîran mijareke girîng e ji bo berxwedaniya li dijî Şerê Taybet, şerê leşkerî û berovajîkirina rastiyan. Derbarê mijarên derbasbûyî de, rewşenbîr û yek ji mamosteyên Zanîngeha Rojava Rakan Şêxê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Hûn siyaseta gef û êrişan, herwiha tuhmetên parçebûnê yên ku li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve tên kirin çawa dinirxînin?**

Wekî ku em dizanin, ji dema damezrandina Rêveberiya Xweser di sala 2014'an de, kampanyayên medyayî û siyasî dest bi reşkoirina wêneya wê kirine û herdem Rêveberiya Xweser û QSDê bi cudaxwazî û parçekirina Sûriyê tawanbar dikin û ev yek bû encama êrişên leşkerî ku Tirkiyeyê li dijî herêmên xweser (Efrîn, Serêkanî û Girê Spî) gelek operasyonên leşkerî dane destpêkirin û ev operasyon wekî beşek ji siyaseteke sîstematîk a ji bo têkbirina projeya demokratîk û wekî rêbazek ji bo qelskirin û rûxandina Rêveberiya Xweser. Ji ber ku Rêveberiya Xweser mînakek serkeftî ye ji bo bicîhanîna prensîbên rêveberiya hevbeş, ku tê de hemî pêkhate - Kurd, Ereb, Suryanî, Tirkmen, Ermenî, Çerkez û yên din - di saziyên ewlehî û rêveberiyê de bi awayekî rêjeyî û wekhev têne temsîl kirin. Ji xwe Konferansa Pêkhateyên Sûriyê ku di 9'ê Tebaxa 2025'an de hat lidarxistin delîlek eşkere ye ji bo tiştên ku me bi dest xistine û ew peyamek pir girîng û zelal e ji bo hikûmet û raya giştî ya Şamê bû. Helbet ev nimûne ji ezmûna navendî ya li Şamê cuda ye ku bi polîtîkayên dijî-kêmneteweyan, ferzkirina nasnameyek yekane, mezhebî, olî û neteweyî ku cihêrengiya çandî, olî û etnîkî ve tê naskirin. Lê belê, Rêveberiya Xweser û QSD'ê rojane rastî gefan tên, hem ji aliyekî ve ji hikûmeta Şamê û Tirkiyeyê û ji aliyê din ve ji DAIŞ'ê û şaneyên wê yên veşartî rû bi rû ye.

**Di dema heyî de pêwîst e rewşenbîr ji bo piştgiriya Rêveberiya Xweser çawa tevbigerin?**

Divê hemû gelê me û saziyên me bi tevahî hişyar bin û her saziyek divê wekî şaneyek krîzê bixebite da ku bi pirsgirêkên ji van êrîşkaran derdikevin re rû bi rû bimîne, bi taybetî bare mezin dikeve ser mile rewşenbîran ji ber ku rewşenbîr neynika civakê ne û helwest û xebatek mezin ji wan tê xwestin di serî de divê bi organîzekirina komxebat, komên nîqaşê û semîneran li ser girîngiya xwerêveberiyê û feydeyên wê, wekî handerên hişyariya civakê tevbigerin. Divê çanda demokratîk û têgehên têkildarî mafên mirovan û wekheviyê di navbera hemû pêkhateyan de werin belavkirin, da ku bibin alîkar ku nasnameyeke hevpar di nav civakê de xurt bibe. Çavdêrîkirin û analîzkirina polîtîkayên herêmî tiştekî girîng e lewma jî rewşenbîr divê di polîtîkayên herêmî de roleke çavdêrîkirin û analîzkirinê bilîzin da ku zelalî û hesabdayînê biparêzin. Parastina diyalog û lêborînê. Pêşxistina diyaloga berfireh di navbera hemû aliyên siyasî, pêkhateyên herêmê de ji bo pêşxistina yekîtî û aramiyê girîng e. Rewşenbîr divê nirxê diyalog û lêborîn di navbera çandên cûda de pêş bixin, û tekez bikin ku ev cihêrengî hêza ku piştgiriya Rêveberiya Xweser û QSD'ê dike ye. Hevkariya bi civaka navneteweyî re jî xaleke cidî ye. Rewşenbîr û raya giştî divê bi saziyên navneteweyî û mafên mirovan re têkiliyan deynin da ku rewşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyê şîrove bikin, ku ev yek dikare piştgiriya navneteweyî ji bo Rêveberiya Xweser bikişîne û cih û mekaneta wê li ser qada navneteweyî xurt bike.

**Hetanî ku zextên ku Tirkiyê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike bên rawistandin, hem jî destkeftiyên heyî bên parastin pêwîst e çi were kirin ji hêla rewşenbîran ve?**

Divê civak ji bo gefên derveyî, çi ji hikûmeta Tirkiyê be çi ji hêzên din be, amade be. Ev dikare bi rêya hişyarkirina raya giştî li ser xetereyên pêkan û amadekariya rûbirûbûna her kiryareke dijminane li dijî Rêveberiya Xweser were kirin. Hevrêzkirina hewildanan di navbera aliyên siyasî û civakî yên cihêreng de siyaseta Rêveberiya Xweser xurt dike û piştgiriya wê ya pêwîst misoger dike. Rewşenbîr divê yekîtiyê di navbera hêzên cihêreng de pêş bixin da ku nerîn û helwesta hevpar ji bo pêşerojê bi dest bixin. Di dawiyê de, Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê destkeftiyek dîrokî temsîl dike ku divê were parastin û xurtkirin. Rewşenbîr û raya giştî di vî warî de berpirsiyariyek mezin hildigirin, bi rêya tevlêbûna çalak û famkirina tevahî hemû pirsgirêk û derfetan. Çalakiya hevbeş û domdar dê wan bihêle ku bi pirsgirêkan re rû bi rû bimînin û pêşerojek ewle û aram misoger bikin ku her kes tê de mafên wekhev û destkeftiyên mayînde bi dest bixe.

## 9'ê Cotmehê yên bê dawî...



**Zekî Bedran**

Salek din jî li ser kompleya navnetewî ya li dijî Rêber Apo re derbas bû. Komplo di 9'ê Cotmeha 1998'an de dest pê kir, dema ku Rêber Apo ji paytexta Sûriyê ji Şamê derket û di 15'ê Sibata 1999'an de li Enqerê bi dawî bû. Ji wê demê ve Rêber Apo li Girava Îmraliyê tê dîl girtin. Dema ku ew kesên ku li ser desthilata Tirkiyê ne, niha îdîa dikin ku biratiya Kurd û Tirk ava dikin, Rêber Apo hîn jî di destê wan de dîl girtiy e. Rêber Apo, ku gavên dîrokî û efsûnî avêtiye û weke aliyê Kurd pirsgirêk çareser kir. Astengiyên ku herî zêde Tirkiyê dikirin hincet, ji holê rakir. Hebûna PKK'ê û têkoşîna çekdarî bi dawî kiriye. Lê hikûmeta Tirkiyê ti gav neavêtiye. Kiryarên ku ji 9'ê Cotmehê heta îro qewimîne, pêdivî bi nivîsandina gelek pirtûkan heye. Divê bê zanîn ku Rêber Apo careke din barê van salên dijwar hilgirtiye li ser milên xwe. Rêber Apo 26 salan di şaneye kê de derbas kir ku ji bo jiyana demdirêj ne guncawbû ku mirov bi zorê dikaribû nefes bigire. Wekî hêjayi jiyana derwêşan, Rêber Apo ramanên xwe pêş xist û kûrtir kir. Rêber Apo planên ji holê rakirina Rêbertî û tevgera xwe têk bir. Rêber Apo di misogerkirina serkeftina gelê Kurd de li hundir jî rolek diyarker lîst. Di dîroka Kurdistanê de yekem car ew dîrok hat jiyan kir in. Bi gelemperî, dema ku pêşengên Kurdan dihatin girtin, ew dihatin îdamkirin û bi awayekî hovane dihatin qetil kirin û li pey wan jî komkujî û mişextî dihatin li serê civaka Kurd. Ji bo cara yekem li Kurdistanê Rêber Apo serhildanek ku 50 salan dom kir û bê ku gav paş de biavêje têkoşîn meşand. Rêber Apo her çar beşên Kurdistanê di raman û ruh de kir yek, sînorên ku ji hêla dagirkeran ve hatine xêzkirin bêwate kir. Rêber Apo ji ber rola xwe ya şoreşgerî û azadîxwaz li Rojhilata Navîn bû armanc. DYA jî hevkariya komployê kir. Wan dixwest Rojhilata Navîn ji nû ve teşe bidin da ku serdestiya xwe xurt bikin. Wan destwerdana xwe bi Rêber Apo dest pê kir. Çalakbûn û ezmûna Rêber Apo ya şoreşgerî, jêhatîbûna wî ya bikaranîna derfetan û pêşengtiya Rêber Apo wekî gef dihatin dîtin. Bülent Ecevit, Serokwezîrê kevin ê wê demê, digot, "Ez fêm nakim çima DYA Apo da me." Lê welatên ku li Rojhilata Navîn xwediyê berjewendiyên xûrt bûn, pêşengîya Rêber Apo û rola wî ya xurt baş fêm dikir in. DYA û hevalbendên wê qet bi awayekî erênî behsa Rêber Apo nekirin, qet jî di derheqê wî de mafên wî yên jiyanî qet ne xistine rojeva xwe de. Her tim wekî qedexe û terorîstekî nêzbûn e. Rêber Apo li hemberî serdestên cîhana kapîtalîst operasyonek da destpekirin û pir baş dahûrandin kirin. Ev yek veguherand lêpirsînek bêdawî. Rêber Apo, di encamê de, lêgerînên xwe yên felsefî, bîrdozî û teorîk li dijî pergala kapîtalîst û serdestên wê domand. Xwe bi kûrahî û hêzek mezintir dixemiland. Bi vîneke bêhempa liberxwe da û têkoşîn kir. Hewldanên ji bo jibîrkirin, bêbandorkirin û jiholêrakirina dewletên hegemon û berjewend perest têk bir. Derfetên bêhempa bi dest xist. Hêdî hêdî bandor û hêza xwe zêde kir. Bi şoreş û gel re bû yek, her tim bû rojev û rêberê gerdûnî.

Rojava, ji aliyê erdnigarî û hejmar ve jî, beşa herî biçûk a Kurdistanê bû. Kesî hêvî nedikir ku şoreş bi vî şêwazî pêş bikeve. Her tim wekî herêmeke piştê dihat dîtin, ku piştgirî dida beşên din. Lê Rêber Apo jî dest dabû ser vê mijarê û bi xwe xwedî li gelê Rojava derketibû û ew birêxistin kiribû. Guherîna şert û mercan Rojava anî pêş. Rêber Apo vîna xwe nîşan da û pêvajo destwerdan kir. Rojava hêdî hêdî bû xeta pêşeng ya şoreşê. Di vî warî de, ew bû armanca dewleta Tirk. Ji bo redkirina statuya Kurdan, tiştek ji ber çavên xwe ne digirtin. Wan bi komên hov yên wekî çeteyên DAIŞ û El Nusra re hevpeymanî çêkirin. Wan endamtiya xwe ya NATO'yê bikar anî û her rêbazek ceribandin da ku DYA û hêzên Ewropî bikişînin nav xwe. Wan hewl da ku Kurdan ji cîhanê veqetînin û hemî pêşketinên erênî ji aliyên Kurdan ve asteng bikin. Wan Rûsya kişandin nava van planan, hewl dan ku eniyek dijber bi navê pêvajoya Astanayê pêş bixin. Bi rêkeftina Rûsan re, wan di sala 2018'an de Efrîn dagir kir. Efrîn ji Kurdan hate valakirin û hat dagirkirin. Efrîn jî bi dewleta Tirk ve hat girêdan! Vê carê, di 9'ê Cotmehê de, bi rêkeftina bi Trump re, Serêkaniyê û Girêsîpî dagir kirin, careke din hatin hilbijartin. Ev herêm ji sala 2019'an û vir ve di bin dagirkeriya Tirkiyê de ne û li wir tu Kurd nemane. Paqijiyeke etnîkî jî li wir hat kirin. Dema vê dagirkirinê ya 9'ê Cotmehê jî bi zanebûn hat hilbijartin. Dixwestin ji Rêber Apo re bibêjin, "Hûn Rojava rêxistin bikin, hûn vîna xwe nîşan bidin, em ê bersiv bidin û destkeftiyên we ji holê rakin." Wan Şengal jî di nav vê de girt. Şengal dîsa bi rêkeftineke ku bi dizî ji hêla PDK'ê ve, dewleta Iraqê û dewleta Tirkiyê ve hat îmzekirin, dihat xwestin ku di 9'ê Cotmehê de were dagirkir in. Balkêş e ku dewleta Tirkiyê bi baldarî 9'ê Cotmehê hilbijart. Bi vê yekê, dixwestin ji Kurdan re bibêjin, "Hûn nikarin ji me birevin; em her tim li pey we ne." Komplo û dagirkerî bênavber berdewam kirin. Biryara wan a di derbarê Kurdan de ew e ku di sedsala 21'an de wan bê nasname û statu bihêlin. Bi rastî, eger Kurd xwedî statu û nasnameyek bana, ev cîhan wê hilweşiyaba! Her çend ew îdîa dikin ku birayên Kurd û Tirk in jî, ew gefê li Rojava dixwin. Ew mil bi mil li gel HTŞ'ê radiwestin. Bi awayekî, ew HTŞ'ê li ser Kurdan re digir in…

## Komploger dîsa li Şamê ne!



**Farûk Sakik**

Her tişt ji Şamê dest pê kir. Kompleya Navneteweyî ya li dijî Rêber Apo, di 9'ê Cotmeha 1998'an de dema ji Şamê derket, dest pê kir. Ev komplo ne tenê êrîşek li ser kesayetekê bû, stratejiyek berfireh a dewletên mezin ên cîhanê bû û armanc jî têkbirina têkoşîna azadiyê ya Kurdan bû.

Rêber Apo, ku ji bo parastina mafê Kurdan û avakirina civakeke demokratîk têkoşîn dabû, ne tenê wekî rêberê PKK'ê, lê wekî feylesûfekî siyasî yê mezin dihat nasîn. Ev yek bala komplogeran jî kişandibû. Ramanên parastina gelan a sedsala 21'ê bû. Ev raman li pêşiya komplogeran asteng bû ku ligor keyfa xwe hespê xwe bibezînin. Ji bo vê yeke, komplo ne tenê girtina wî ya fîzîkî bû; wan armanc dikir ku paradîgmaya wî yên wekî Konfederalîzma Demokratîk, Ekolojîk, azadiya Jinê û Civakî têk bibin. Nedixwestin gelên Rojhilata Navîn di nav aştiyek meyinde, bi aramî bijîn.

Ev paradîgmaya wî li dijî sîstema modernîteya kapîtalîst a navneteweyî bû. Rêber Apo di nivîsên xwe de dibêje: "Ev komplo ne li dijî min e, lê li dijî aştiya Rojhilata Navîn e."

Piştî ku ji Şamê derket û li welatên Ewrûpa û Rûsya bû, wî dixwest bi hewldanên diplomasiyê, piştgiriyekê ji bo çareseriyeke siyasî ya pirsa Kurd bibîne. Ji xwe têkoşîna wî ne tenê leşkerî bû; stratejiyek siyasî ya ji bo parastina gelan bû. Li Ewrûpa jî bi du wî ketin.

Îro ev hêz dîsa hatin li dora Şamê diçin û tên. Rêber Apo jî di çareseriya doza Kurdistan de bal dikişîne ser vê heremê. Rêber Apo di têkoşîna xwe ya salan her tim Şam nîşan dida. Wî dizanibû Şam qonaxek berî fînala şerê komplogeran e. Herçiqas hûn navenda vî şerî, Filistîn, Hamas, Îsraîl û Îran nişan bidin jî, di esasê xwe de ev şer, şerê Şamê ye. Amerîka hin qozên xwe yên bi Rûsya re li ser Şamê re parve dike. Dema ku di 7'ê Kanûna 2024'an de, Beşar Esad û Rûsya ji Rojhilata Navîn, derketin, Îngiliz û Amerîka dora rojê li heremê bûn. Heger bavê Esad liberxwe bida, wê kompleya nêz dibe bidîta û teslîmî komplogeran nebûya, Beşar Esad, belkî hên jî li Şamê û hên jî bihêz bû. Rûsya ew baş diparast. Bi derketina Abudullah Ocalan ya ji Şamê, hatina Amerîka ya Rojhilata Navîn rastî heman demê hat. Dema ku em dibêjin Şam, em li aliyek jî behsa Rojavayê Kurdistanê dikin. Di van demên dawî de peyamên wî yên di derbarê parastina Rojava de, di nav civakê de hatin parvekirin. Civak dema buyerek biqewime li benda peyam û nirxandinên wî disekinîn. Dîbêjin ka serok wê rêyek çareseriyê ya çawa pêşniyar bike. Herkes li benda heyetên Îmraliye ne. Hevalek min li Amedê hebû wî digot, em diçin kuderê, ji hemû beşên civakê ji me dipirsin. "Heyet ji gravê vegeriya an na?" Kesên diçûn Îmrali cem Rêber Apo di heman demê de hawariyên wî bûn. Qasidê wî bûn. Çav û guhê herkesî li riya van hawariyan bûn. Ka wê ji Îmraliyê peyamek bi çi rengî werînin.

Ev hawariyên Îmrali di van rojan de nîrxandinên wî yên derbarê Rojava û Şamê de anîn. Behsa xeta sor dike. Behsa metirsiya siyaseta li ser Şamê dike. Salek berê dema pêvajoya 'aştî û civaka demokratîk' destpêkir, bal kişandibû ser şerê Rojhilata Navîn û bi taybet jî şerê Sûrî. Komlogerên ku eva 27 sale biserneketine, îro dixwazin li Şamê komployê bi encam bikin. Îro Kurd jî li gor xeta wî ya sor a parastina Rojavayê Kurdistan tevdigerin.